**Mukaddime, 2024, 15(2), s. 478-501.**
**DOI: 10.19059/mukaddime.1490480**

# Dîroka Zirkîyan û Beşdarîya Wan di Çanda Kurdî da

**Zülküf Ergün**[1]

## Zırkilerin Tarihi ve Kürt Kültürüne Yaptıkları Katkılar

### Öz

Zirkiler Kürtlerin son bin yıllık tarihinde önemli Kürt hanedanlarından biri olup *Şerefname*'de kendilerinden ayrıntılı bahsedilir. Şerefhan bu hanedanın kurucu babası olarak kabul ettiği Şeyh Hasani Ezraki'den kendi dönemine kadar bu önemli hanedandan bahsetse de daha çok 16 yüzyıl tarihlerine yer verir. Uzunca bir süre ihmal edilen bu konu son yıllarda tekrar bazı araştırmacıların dikkatini çeker. Böylece Zirkiler bazı kitap ve makalelerin inceleme konusu olur. Bu çalışmada Zirkiler hakkında elimizde var olan bilgileri sistematik bir şekilde ortaya koymayı, Zirkilerin tarihindeki çelişki ve boşlukları belirlemeyi, iç sorunlarını tespit etmeyi ve Kürt kültürüne yapmış oldukları katkıları gün yüzüne çıkarmayı amaçlıyoruz. Bu çalışmanın sonunda Zirkilerin son bin yılda Kürt siyasi tarihindeki önemli katkılarda bulunduklarını, Kürt tarihinde güçlü bir konum elde ettiklerini ve Kürt kültürü açısından önemli tarihçi, edebiyatçı ve alimleri yetiştirdiklerini savunuyoruz.
**Anahtar Kelimeler:** Zirki, Kürt, Mit, Tarih, Kültür.

### Abstract

The Zirkis are one of the most important Kurdish dynasties in the last thousand years of Kurdish history, and they are mentioned in detail in *Sharafnamah*. Although Şerefhan mentions this important dynasty from the time of Sheikh Hasani Ezreqi, whom he considers the founding father of this dynasty, to his own time, he mostly includes their history in the 16th century. After a long hiatus, this subject has attracted the attention of some new historians and researchers in recent years. Thus, the Zirkis became the subject of some books and articles. In this study, we aim to systematically present the information we have about the Zirkis, to identify the contradictions and gaps in their history, to identify their



1. Doç. Dr. Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, zxweshevi@gmail.com, ORCID: 0000-0001-8784-5636.

**Makale Gönderilme Tarihi** / *Article Submission Date*: **27.05.2024**
**Makale Kabul Tarihi** / *Article Acceptance Date*: **04.07.2024**
**Yazarlar dergide yayınlanan çalışmalarının telif hakkına sahiptirler ve çalışmaları CC BY-NC 4.0 lisansı altında açık erişim olarak yayımlanmaktadır.**
*Authors own the copyright of their work published in the journal and their work is published as open access under the CC BY-NC 4.0 license.*

internal problems and to bring to light their contributions to Kurdish culture. Thus, at the end of this study, we argue that the Zirkis have made significant contributions to Kurdish political history in the last millennium, have gained a strong position in Kurdish history, and have raised important historians, literary figures and scholars for Kurdish culture.
**Keywords:** Zirki, Kurd, Myth, History, Culture.

## Kurte

Zirkî di hezar salên dawî yên dîroka kurdan da yek ji binemaleyên giring ên kurdî ye ku di *Şerefname*yê da behsa wan tê kirin. Şerefxan ji Şêx Hesenê Ezreqî yê bavê damezirînerê vê binemaleyê, heta dema xwe behsa vê binemaleya giring bike jî giranî dide ser dîroka wan a sedsala 16ê. Piştî navbereke dirêj ev mijar di van salên dawî da bala çendîn vekolerên nû dikêşe û Zirkî dibin mijara çendîn gotar û pirtûkan. Em bi vê xebatê hewl didin van zanyarîyên li ser Zirkîyan bi awayekî sîstematîk bixine rû, nakokî û valahîyên dîroka Zirkîyan dîyar bikin, kêşeyên wan ên navxweyî destnîşan bikin û beşdarîya wan di çanda kurdî da ron bikin. Ji ber vê em di dawîya vê xebatê da digihîjin vê encamê ku Zirkî di hezar salên dawî da çawa di berhemanîna dîroka kurdî ya sîyasî da dibin beşdarên giring, di dîroka çanda kurdî da jî dibin xwedî pêgeheke bihêz ku ji nav wan hin dîroknûs, edîb û zanayên giring derdikevin.
**Bêjeyên sereke:** Zirkî, Kurd, Mît, Dîrok, Çand.

## Extended Abstract



The Zirkis are one of the most important Kurdish dynasties that ruled in the last millennium. The most comprehensive information about this dynasty is contained in Şerefname, the most important source of Kurdish history. Therefore, for a long time, the information about the Zirkis contained in the *Sharafnamah* was passed down unquestioningly and accepted as the only truth. However, when we take other historical data into consideration, we find that the information provided by Sharafkhan about the beginning of this dynasty resembles a myth rather than a historical fact. It is understandable that the Kurdish ruling classes, who had largely converted to Islam shortly after the emergence of Islam and had regional powers under the influence of Islamic civilization during the Abbasid period, sought a religious origin in order to gain a ruling advantage over their fellow Kurds and thus attributed themselves to the Arabs. Therefore, in the first part of this study, we examine the origin myth of the Zirkis within this framework.
Although it is difficult to separate political history from mythology in ancient times, this intertwining can be separated to some extent by comparing data and diversifying sources. In this study, unlike the mythological foundation story in the Sharafnamah, there is information that the Zirkis existed in the region long before the Mardin Artuqids and were organized as a large tribal confederation. Although their sphere of influence varied from time to time, the Zirkis mostly ruled the major castles and cities between the provinces of Mardin, Diyarbakır and Bitlis. The Zirkis, who ruled an important city like Meyafarkin (Silvan) in the

1300s, sometimes in conflict and sometimes in agreement with the Ayyubids, later split into Atak, Tercil, Derzin and Gırdıkan branches and continued their existence as autonomous principalities for a long time, as stated by Şerefhan. Although their castles were confiscated for a while as a result of the attacks of the Akkoyunlu, Karakoyunlu and Safavids, the Zirkis soon regained their lands and resumed their administrative power. Therefore, after the Kurdish principalities came to an agreement with the Ottoman Empire and joined them, the Ottoman Empire recognized the ruling privilege of the Zirki dynasty until the first half of the 19th century, as was the case with other important principalities. However, as a result of the centralization policy of the Ottoman Empire, the Zirki principalities, like other Kurdish principalities, lost their administrative privileges in the 1830s. Thus, a Kurdish dynasty with a thousand years of ruling experience would be eliminated.

In the third part of this study, we discuss the administrative problems of the Zirki principalities as an example of the typical weaknesses of other Kurdish principalities in general. As in other principalities, the election of a new bey to replace a deceased one is an important administrative problem in the Zirki principalities. Especially during the Ottoman period, family members who could not agree on governance often traveled to the Ottoman capital, Istanbul, to solve their problems there, or to ask for support against their rivals by lending certain financial privileges to the beylerbey in Diyarbakır, thus weakening their governance. Ottoman sultans and pashas often used this opportunity to intervene in the Zirki principalities and sometimes appointed administrators from the center to punish them. Especially when the Iranian threat diminished, the Ottomans adopted a harsher and more brutal attitude towards the Zirki beys. Another administrative weakness of the Zirki beys was their rivalries and civil wars among themselves and with neighboring tribes and principalities. The Zirkis' rivalries with their neighbors the Silivis and especially the protracted civil wars between the principalities of Derzin and Girdikan are examples of this. Finally, as in any monarchical rule, the Zirki principalities also suffered from administrative weaknesses due to the child beys who ascended to the throne at a young age.



In the last part of this study, we will discuss the contributions of the Zirkis to Kurdish culture through the examples of three important historical figures. Ibn al-Azraq is an important figure in recording a certain period of Kurdish history, as he wrote the history of the city of Meyafarkin, which was ruled by the Zirkis long before Sherefkhan. Therefore, the Zirkis bring an important figure to Kurdish history. In the field of literature as well as history, the Zirkis produced an influential and pioneering figure. Mir Yakubi Zirki wrote a divan in the 15th century, becoming the first known Kurdish lord poet. Mir Yakub, whose divan has not survived to the present day, has an important place in terms of writing the first known Kurdish divan in Kurmanji dialect of Kurdish. Finally, by mentioning Mevlana Muhammad Zirki, whose name is mentioned in the Sharafnamah and whose surname indicates that he was a Zirki, we conclude that the Zirkis raised important historians, literary figures and scholars in their historical journey and made important contributions to Kurdish culture.

**Destpêk**

Nivîsîna dîrok û serborîya çandî ya gelekî jihevketî û belawela gelek dijwar e û jê ra hedar û xebateke berdewam û demdirêj pêwîst e. Lewra kêmasîya nebûna desthilateke navendî û çênebûna bîr û arşîveke hevgirtî ya neteweyî heta radeyekê bi vî awayî dikare bê çareserkirin. Ji ber şerên xwînawî, talanên berdewam û endoktrînasyonên dînî û îdeolojîk ên herêmê, şopên dîroka kurdan a berî îslamê bi başî xuya nakin û herçî piştî îslamê ye, ji ber nebûna desthilateke berdewam û yekgirtî ya kurdî gelek berhemên li ser kurdan yan ji nav diçin yan jî winda dibin û nagihîjin îro. Ji nav van, herçend bi zimanê kurdî nebin jî *Tarîxa Meyafarqînê* ya Îbnu'l Ezreqî, *Tarîxa Dewleta Kurdan* a Xezrecî, *Tarîxu Hisn Keyfa*ya Hesen Hisnî û *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî çend çavkanîyên giring in ku li ser dîroka kurdan zanyarîyên giring li xwe digirin. Bi taybetî *Şerefname* ji alîyê dîroka mîrektî û binemaleyên giring ên kurdan ve mînakeke yekta ye.

Herçend Mela Mehmûdê Bazîdî di salên 1850yan da wek dewama *Şerefname*yê *Tarîxa Cedîd a Kurdistanê* binivîse û ji dema ku Şerefxanî hiştîye heta dema xwe behsa rûdanên giring bike jî mixabin ev berhema giring winda ye û heta niha jî kes nizane çi bi serê wê da hatîye. Ji ber vê li ser dîroka kurdan a sedsala 17 û 18ê valahîyek heye. Herçend di van salên dawî da hin dîroknasên kurd û bîyanî bi palpiştîya belgenameyên Osmanî û Îranê hin zanyarîyên nû derxin jî gelek xalên tarî û nezelal hene. Xweşbextane di van salên dawî da êdî mijarên taybetî yên dîroka kurdan dibin mijara gotûbêj û vekolînan û ev hûrgilî rê li ber me vedikin ku em hin alîyên tarî yên dîroka xwe baştir bibînin.



Gelek dîroknas dema ku berê xwe didin raborîyê bi piranî tiştên "mezin û giring" dibînin û dîroknûsîya wan li dor vegêrana serborîya dewlet û kesayetîyên bihêz teşe digire. Ji ber vê miletên ku ji vê derfetê bêpar dimînin, nakevin ber kadraja dîroknûsîya wan û gelek caran nayên dîtin. Ji bo nivîsîna dîroka miletên weha pêwîstî bi kar û xebatên zêdetir hene da ku hêdî hêdî ji beşên biçûk ên dîroka wan dîmeneke temam derkeve. Ji vî alîyî ve dîroka kurdan parîyek jî ji dîroka hoz û binemaleyan pêk tê û dîroka giştî ya kurdan bi teswîrkirina dîroka van yekeyên civakî tê pêkanîn. Şerefxan di dema xwe da karekî weha dike û berê xwe dide van hûrgilîyan ku em di piranîya pirtûkên dîroknûsên serayên împaratorîyan da nabînin. Di vê çarçoveyê da cara pêşî ew li ser Zirkîyan[2] agahîyên rêkûpêk dide me.

Piştî navbereke dirêj di serê sedsala 20ê da Ekrem Cemîl Paşa di gotareke xwe da (1919) behsa Zirkîyan dike û di çarçoveya zanyarîyên Şerefxan û Naîmayî da kurteyeke dîroka wan dixe rû (Veroj, 2023: 305-306). Em dikarin bibêjin ku xebatên li ser Zirkîyan di van salên dawî da gur dibin û çend dîroknasên profesyonel û vekolerên serbixwe berê xwe didin vê mijarê û hin zanyarîyên nû

[2] Ev nav di çavkanîyên dîrokî da bi piranî wek "Ezreq, Ezreqî û Zirqî" derbaz dibe. Li gor tespîta Şerefxanî "Ezreq" bi demê ra sivik dibe û dibe "Zirqî", "Zirqî jî piştî demekê sivik dibe û dibe "Zirkî". Ji ber vê niha hem gelê herêmê hem jî vekolerên dawî ji bo binavkirina vê binemale yan jî hozê peyva "Zirkî"yê bi kar tînin û me jî ji ber vê çendê ev guherte tercîh kir.

pêşkêşî raya giştî dikin. Alpay Bizbirlik (1996) di du gotarên xwe da bi palpiştîya belgenameyên Osmanî rewşa sedsala 16ê ya sancaqên Entax û Tercîlê berbiçav dike ku di bin hikumranîya Zirkîyan da ne. Herweha Uğur Bahadır Bayraktar (2017), Mehmet Rezan Ekinci (2022) û Davut Adlığ (2021) li ser Zirkîyên Entaxê, Ercan Gümüş di du gotarên xwe da (2021, 2024) li ser sancaqên Mîhranî û Tercîlê û Abdusselam Ertekin jî li ser Temir (Tîmûr) Begê Zirkî (2021) radiweste. Ji bilî van gotaran, Fatih Pekol (2017) li ser dîroka begên Zirkî tezeke mastirê amade dike, Şakir Epözdemir li ser Zirkîyên Dêrzinê (2011), Süreyya Işık (2021) û Fuat Işık (2023) li ser Zirkîyên Liceyê û Murat Budak (2023) jî li ser Zirkîyên Hezroyê pirtûk dinivîsin. Taybetmendîya van xebatên dawî jî ev e ku giranî didin ser dîroka malbatê ya piştî ji destdana mîrîtîyê û di çarçoveya nostaljîyekê da hewl didin bîranînên xwe yên malbatî zindî bikin. Lê di van bîranînan da carinan mirov rastî hin zanyarîyên giring jî tê ku ji alîyê çavkanîyên dîrokî ve nehatine tomarkirin. Ji vî alîyî ve ev xebatên amator jî valahîyekê dadigirin û giring in.

Bi palpiştîya van xebatan em dixwazin di vê gotarê da hin valahî û kêmasîyên vê mijarê temam bikin û parîyek be jî xebatên vê qadê ber bi pêş ve bibin. Ji xebatên berê cudatir em zanyarîyên Şerefxanî yên li ser destpêka dîroka sîyasî ya vê binemaleyê wek mîtekê sîyasî şirove dikin û pêşî cih didin vê mijarê da ku mît û dîrok ji hev bên cudakirin. Ji ber ku em bi çavê mîtekê li zanyarîyên Şerefxanî yên li ser destpêka vê binemaleyê dinêrin, em cih didin hin zanyarîyên din ên cîyawaz û bi gotûbêjkirina van zanyarîyên nû dîroka Zirkîyan heta sedsala 19ê teswîr dikin. Li dû vê em desthilata Zirkîyan wek prototîpeke biçûk a mîrektîyên kurdî werdigirin û kêşeyên desthilatdarîya wan û sedemên lawazîya wan gengeşe dikin. Herî dawî em behsa çend kesayetîyên giring ên Zirkî dikin ku di dîroka çanda kurdî da xwedî giranî û karîgerî ne. Bi vî awayî em hewl didin ku giringîya vê binemaleyê di dîroka kurdan a sîyasî û çandî da berbiçav bikin. 482

### 1. Mîta Destpêka Hikumranîya Binemaleya Zirkî

Her destpêk û avakirin, bi piranî xwe dispêrin mîtekê û ev mît di çarçoveya nirxên serdema xwe da teşe digirin. Dîn di serdema îslamî da mîna gelên din ên musluman, di nav civaka kurdî da jî dibe nirxa giring a serdemî û hemû destpêk û avakirin li ser vê nirxê tên damezirandin yan jî ji nû ve tên şirovekirin. Ji ber vê beşek ji binemaleyên kurd ên hikumran li dor seyîdtî û şêxîtîyê, gelek caran bi şecereyên destkird û çîrokên vêkxistî ji xwe ra reheke "pak, bilind û raser" destnîşan dikin û zemîna hikumranîya xwe bi van şecere û vegêranan xurt dikin. *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî bi mîtosên (çîrok) weha dagirtî ye ku gelek binemaleyên kurd xwe dispêrin rehên "pîroz û necîb" da ku ji bo xwe sedemeke serdestî û cîyawazîyê peyda bikin û rê li ber rêzgirtin û rewakirina rêveberîya xwe xweş bikin.

Ne tenê çanda dînî, çanda sîyasî ya wê serdemê jî piştgirî dide vê arasteyê, lewra di serdema Emewî û Ebasîyan da çanda îslamî-erebî digihîje pileyeke bilind û ji alîyê rêveberîyê ve jî sedemeke "necabet"ê çê dibe. Ji ber vê kî ji xwe ra reheke îslamî-erebî bibîne ji alîyê moral ve bi rehetî rêveberîya xwe rewa dike. Li

ser vê bingehê di dawîya hikumranîya Ebasîyan da dema ku kontrola navendî sist dibe, binemaleyên kurd dest bi hikumranîya deverên xwe dikin û di vê çarçoveyê da dest bi dozîn û yan çêkirina mîtên esaletê dikin da ku bi hêza vê nirxa cihgirtî ya serdemî bikarin hikumranîya xwe hêsan, bihêz û rewa bikin. Ercan Gümüş di mînaka Zirkîyan da vê yekê li hember wekhevîya hozên din ên di nav konfederasyona Zirkîyan da wek çêkirina sedemeke raserîya vê binemaleyê nîşan dide (2021: 24) ku kêm zêde ev nêrîn di nav hemû pêşengên binemale û hozên kurdan da tê dîtin û beşek ji wan reha xwe ji alîyê dînî ve yan digihîjînin pêxemberê îslamê yan jî heval û xelîfeyên wî.

Zirkî yek ji van binemale û hozan[3] (eşîret) e ku di çarçoveya çanda dînî û erebî da bavê xwe yê destpêkê şêxekî şamî didin zanîn. Dîyar e Şerefxan Bedlîsî bi rêya berhevkarîyê van zanyarîyan ji endamên vê binemaleyê werdigire û di vê çarçoveyê da dîyar dike ku reha mîrên Zirkî digihîje erebên Şamê û wek bavê pêşî yê vê mîrektîyê jî behsa Şêx Hesenî dike ku ji ber bêgavkirina mercên jîyanê ji welatê xwe derdikeve û li Mêrdînê bi cih dibe (2007: 331). Ji bilî ragihandina Şerefxanî (2007: 341), nevîyên mîrên Zirkî yên Liceyê bi rêya şecereyekê xwe digihîjînin Hezretê Elî (Pekol, 2017: 10; Işık, 2023) û bi vê reha xwe ya pîroz şanazî dikin.

Li hember vê ragihandinê, divê em bizanin ku Hezretê Elî ne tenê çavkanîya seyîdtîyê û bavê xwînî yê seyîdan e herweha di nav piranîya rêbazên sofîgerîyê da bavekî manewî û şahê ewlîyayan e ku gelek şaxên sofîgerîyê wî wek bavê xwe yê destpêkî didin zanîn. Bêguman sofî vê girêdanê di çarçoveya sîlsîleya manewî da berbiçav dikin ku her xelîfeyek bi rêya perwerdeya manewî xwe dispêre bavekî pêgihîştî ku çavkanîya wan bi piranî digihîje Hezretê Elî. Jixwe Şerefxan jî dema behsa bavê pêşî yê vê binemaleyê dike, geh unwan "şêx"î tîne pêşîya navê wî geh jî unwana "seyîd"î. Ji ber vê divê Hezretê Elî ji bavekî xwînî zêdetir wek bavekî manewî bê dîtin û îdîayên nesebî yên weha bi îhtîyat bên wergirtin.

Em dikarin bibêjin ku hin zanyarîyên dîrokî piştgirî didin vê gumana me û rê li ber gengeşekirina seyîdtî û erebîtîya vê binemaleyê vedikin. Hesen Hisnîyê dîroknûsê Eyûbîyên Hisnkeyfayê, di sedsala 14ê da bi aşkerayî behsa kurdbûna Zirkîyan dike û dîyar dike ku Şêx Zeydoyê Zirkî dema ku Meyafarqînê ji Eyûbîyan werdigire ji bo ku ji êrîşa wan ewle bibe û rê li ber wan bigire, di nameyekê da ji serokê Eyûbîyan ra dîyar dike ku ew ji heman nijadî ne, yanî her du alî jî kurd in û pêwîst nake şerê hev bikin (2019: 175). Ev jî nîşan dide ku di salên 1300an da serekên Zirkî behsa kurdbûna xwe dikin û eger ji reheke ereb hatibûna dê di demeke ew çend kurt da eslê xwe ji bîr nekira.

[3] Piranîya hozan li dor malbateke zal (domînant) pêk tên û piştî demekê navê binemaleyê dibe navê hozê û navê hozê jî dibe navê herêma wan. Bi nêrîna me Zirkî navê binemaleyek e ku li dor wan bi demê ra hozekê çê dibe û piştî demekê navê wan dibe navê herêmekê jî. Bi vî awayî Zirkî dibe navê binemale û hozê û Zirkan jî dibe navê devera hikumranîya wan.

Bêguman mîta destpêkê û peydabûna navên vê binemeleyê li dor kesayetîya Şêx Hesenî tê afirandin. Şerefxan, dema ku Şêx Hesenî wek bavê damezirîner ê vê binemaleyê dinasîne çîroka/mîta peydabûna navê "Zirkî" jî bi du ragihandinan ve girê dide. Li gor ragihandina pêşî Şêx Hesen ji ber ku hertim cilên şîn li xwe dike piştî demekê di nav xelkî da bi navê "Şêxê Ezreqî" tê nasîn ("ezreq" di erebî da şîn e) û li gor vegêrana duyem jî navê "ezreq" ji ber çavşînîya Şêx Hesenî lê tê kirin ku bi demê ra ev nav sivik dibe û di nav xelkî da wek "zirkî yan zirqî" cihê xwe digire (2007: 331-332).

Şerefxan çîroka hikumranîya vê binemaleyê jî bi kerameteke Şêx Hesenî ve girê dide ku bi tevahî dîyardeyeke mîtîk e. Li gor wî, dema Şêx Hesen ji Şamê tê li Mêrdînê bi cih dibe ji ber dîndarî û kesayetîya wî ya karîger gelek mirov li dora wî kom dibin. Ji ber vê jî hikumdarê Mêrdînê jê guman dike û wî diavêje zindanê. Lê li hember kerametên wî yên curbicur û girêdana murîdên wî, piştî demekê hikumdarê Mêrdînê poşman dibe, wî azad dike û keça xwe lê mar dike. Li dû mirina vî hikumdarî jî Şêx Hesen cihê wî digire û bi vî awayî hemû welatê Mêrdînê dikeve bin destê wî (2007: 331-332).

Ji ber ku di mîtosê da lihevanîn û afirandin heye Şerefxan di şaxa Zirkîyên Tercîlê da vê çîrokê bi awayekî cîyawaztir radigihîne. Di vê vegêrana duyem da navê "Şêx Hesen"î wek "Seyîd Hesen"î destnîşan dike ku ji Şamê hatîye wîlayeta Mêrdînê û li nahîyeya Entaxê bi cih dibe. Li vir bi awayekî goşegîr bi îbadet û Xwedaperestîyê ra mijûl dibe, ji ber kerametên wî murîdên wî zêde dibin û navûdengê wî belav dibe. Di wê demê da keçeke xweşik a Emîr Artûqê kurê Ekseb jî ji ber sewdayê dîn dibe. Bi fermana Emîr Artûqî hemû hekîmên welatî tên ser keça wî lê nikarin jê ra çareyekê bibînin. Ji ber vê Emîr Artûq hawarîya xwe dibe ber Şêx Hesenê Ezreqî, ew jî li ser avê hinek duayan dixwîne, bi serê keça nexweş da dike û li ser vê keçik baş dibe. Ji bo vê qencîya wî, Emîr Artûq bixwaze keça xwe lê mar bike jî Şêx Hesen vê red dike, loma jî Emîr Artûq keça xwe li kurê wî mar dike û mîrektîya Tercîlê dide wî (2007: 342).



Di salên paşê da ev her du vegêran bi hev ve tên girêdan û bi zêdekirina hin tiştên nû, ji van vegêranan çîrokeke hevgirtî tê çêkirin. Li gor vê, Şêx Hesenê Ezreqî pêşî tê li Mêrdînê bi cih dibe, murîdên wî zêde dibin û ji ber ku hikumdarê Mêrdînê jê dikeve gumanê wî diavêje zindanê. Di zindanê da dema ku ji bo destnimêja sibehê avê nadinê, Şêx Hesen keramet nîşan dide, her sibeh bi tîrêjên rojê digire, ji zindanê derdikeve û diçe li mizgeftê nimêj dike. Çend caran hikumdarê bajêr li mizgeftê wî dibîne û ji berpirsan pirsyara vê rewşê dike. Di encamê da derdikeve ku Şêx Hesen ne bi arîkarîya kesekî, bi rêya kerameteke xwe ji zindanê derdikeve. Li ser vê hikumdar wî azad dike û lêborîna xwe jê dixwaze. Şêx Hesen dema ku ji zindanê tê berdan li Mêrdînê namîne û diçe li Entaxê bi cih dibe. Piştî demekê keça vî hikumdarî nexweş dikeve û dema ku bi arîkarîya Şêx Hesenî keça wî baş dibe hikumdar keça xwe bi kurê wî ra dizewicîne û ji ber vê rêveberîya Entax, Tercîl û Mîhranîyê dide Zirkîyan (Korkusuz, 2004: 114; Budak, 2023: 17).

Li ser vê guherteya nû ya mîtosa afirandinê ya binemaleya Zirkî, ji Şerefxanî cudatir reha peydabûna navê “Zirkî” jî diguhere. Li gor vê, Şêx Hesen ji ber ku bi zirîqê rojê digire û ji zindanê derdikeve ev kerameta wî belav dibe û bi vî awayî “Zirkî/Zirqî” dibe naznavê vê binemaleyê (Korkusuz, 2004: 115). Bi vî awayî bêjeya “Zirkî” ji reha erebî dûr dikeve û kirasekî kurdî li xwe dike. Ji ber vê di 1934ê da dema ku li Tirkîyeyê qanûna paşnavan derdikeve beşek ji endamên binemaleya Zirkîyên Liceyê bi palpiştîya vê guherteya nû, bi tirkî paşnavê “Işık”ê werdigirin ku hevmanaya “zerîk/zerîq”a kurdî ye (Pekol, 2017: 7; Işık, 2023: 12).

Herwek dîyar e, vegêranên mîtîk ji bo lêzêdekirina keresteyên nû yên çîrokî guncaw in û gelek asayî ye ku her vegêr bi awayekî cîyawaz vê mîtê di hişê xwe da ji nû ve saz bike û rengên nû bide pê. Lê balkêş e ku endamên binemaleya Zirkî bi derbazbûna demê ra herçend di reha peydabûna navên xwe da dest ji çîroka “ezreq”a erebî berdin û di şûna wê da “zerîq/zerik”a kurdî bipejirînin jî ji ber sedemên jorîn û berdewamîya paye û giranîya çanda dînî û polîtîkayên dewleta Osmanî dest ji reha xwe ya îslamî-erebî (seyîdtî) bernadin. Loma jî wek “esîlzadeyên kurdan” çavkanîya xwe ya esaletê ne ji reheke kurdî, ji muslumanên ereb werdigirin.

### 2. Dîroka Sîyasî ya Zirkîyan û Cihê Hikumranîya Wan

Mît û dîrok gelek caran di çavkanîyên dîrokî yên berê da tevlihev dibin û *Şerefname* yek ji mînakên tîpîk ên vê dîyardeyê ye. Ji bo ronkirina vê rewşê divê zanyarîyên *Şerefname*yê bi çavkanîyên din ra bên berawirdkirin da ku dîrok û mîtolojî ji hev bên cihêkirin. Ji bo derxistina dîroka sîyasî ya Zirkîyan jî pêwîstîya me bi çavkanîyên din hene da ku em bikarin li ser dîroka wan a sîyasî dîmeneke rasteqînetir derxin holê û xwe ji bin karîgerîya çîrokên mîtolojîk rizgar bikin.

Çawa ku li jor jî amaje pê hat kirin Şerefxan dîroka hikumranîya Zirkîyan bi Şêx/Seyîd Hesenê Ezreqî dide destpêkirin, berî vî kesî bi tu awayî behsa raborîyeke sîyasî ya vê binemaleyê û rêveberîya wan nake û Şêx Hesenê Ezreqî mirovekî sofîmeşreb û terkedinya dide zanîn. Eger em ragihandina wî bikin binema Şêx Hesen li Mêrdînê yan li Entaxê bi rêya karîzmaya xwe ya manewî bal dikêşe ser xwe û ji ber başkirina keça Emîr Artûqî desthilata sîyasî pê tê bexşîn û dîroka wan a sîyasî bi vê rûdanê dest pê dike.

Li hember vê ragihandina berbelav ku çavkanîya xwe ji Şerefxanî werdigire, Ebdullah Varlî di salên 900an da vê binemaleyê wek konfederasyoneke berfireh a hozan dide zanîn ku ji Mêrdînê heta Mûsil û Çîyayê Zagrosê ji 16 hozên bi navên Aştîyan-Aşûtan, Mihranîyan, Bexosîyan, Becinîyan, Şeqaqîyan-Şikakîyan, Estorkîyan, Gurdilîyan, Aşanîyan-Eyşanîyan, Kişkîyan, Çêlkîyan, Xendeqîyan-Xan, Baqîyan, Suhanîyan, Mehmûdîyan, Keşaxîyan-Kaşaxîyan, Mûsîyan û Serbarîyan-Sarbarîyan pêk tên (1997: 385). Dîsa berevajî Şerefxanî, Îbrahîm Bozkurtê ku dîroka hozên kurdî nivîsîye, li ser bavê mîtîk ê vê binemaleyê dîyar dike ku Şêx Hesen di 1001ê da li jîyanê bûye (2021: 232).

Nîşaneyeke din a mîtosbûna zanyarîyên Şerefxanî yên li ser destpêka vê binemaleyê jî peywendîya Şêx Hesen û Emîr Artûqî ye. Şerefxan, Emîr Artûq wek xwedîyê Amed, Mêrdîn, Xarpût, Micengerd û Hisnkeyfayê dide zanîn û dîyar dike ku piştî mirina wî Şêx Hesenê Ezreqî dibe desthilatdarê vî welatî (2007: 341-342). Lê Îbnu'l Ezreqê ku dîroknûsê wê demê ye, berevajî vê ragihandinê dîyar dike ku di 1085ê da Sultan Melîkşah ji bo girtina welatê Merwanîyan wezîrê wan ê berê Fexruddewle Mihemed bîn Cuheyrî wezîfedar dike û ji bo arîkarîya wî bike Emîr Artûqî paşê dişîne. Jixwe dema ku Fexruddewle welatê Merwanîyan digire tu cih nade Emîr Artûqî (2023: 477) û ew jî di heman salê da dikeve bin fermana Tutuşê mîrê Selçûqîyên Sûrîyeyê û ev mîr di 1085ê da Qudsê weku îqta dide pê û navborî di 1091ê da li vir dimire (Azimli, 2008: 14). Ev nîşan dide ku kesê ku welatê Merwanîyan girtîye û serwerîya wê kirîye ne Emîr Artûq e û nabe ku Şêx Hesen keça wî baş kiribe û piştî mirina wî jî ev welat ketibe bin destê wî. Jixwe çavkanîyên dîrokî dîyar dikin ku damezirînerê Artûqîyên Mêrdînê Necmedîn Îlgazî ye û hikumranîya wan li Mêrdînê di 1113an da dest pê dike (Fariqî, 2023: 478). Ev jî nîşan dide ku Zirkî berî Artûqîyan li vê herêmê hene û divê zanyarîyên Şerefxanî di vê mijarê da bên sererastkirin.

Em bi başî nizanibin ka xwe dispêre kîjan çavkanîyên dîrokî jî Ebdulah Varlî li ser dîroka Zirkîyan a sedsala 13ê hin agahîyan dide, ji Şerefxanî cudatir ne Entax û Tercîlê, di vê demê da Dêrzinê wek navenda Zirkîyan dide zanîn û dîyar dike ku li Dêrzinê ji vê binemaleyê bi dorê Emîr Feremozê Zirkî (1211), Fîrozşahê Zirkî (1260), Emîr Hesenê Zirkî (1307), Şêx Mihemed, Şêx Zeydo, Şêx Îzedîn, Şêx Hesen, Emîr Ebdurehman, Şêx Hesenê Çarem hikum dikin (1997: 388-390) ku di *Şerefname*yê da behsa yekî ji wan jî nayê kirin.



Hesen Hisnîyê nivîskarê *Tarîxu Hisn Keyfa*yê li ser dîroka Zirkîyan a sedsala 14ê dîyar dike ku Artûqîyên Mêrdînê di 1325ê da dema ku êrîşî Hisnkeyfayê dikin rêveberên Eyûbî yên li Meyafarqînê, diçin arîkarîya wan û di vê demê da li gor ragihandina xelkê Amedê bajêr teslîmî Şêx Zeydoyê Zirkî yê xwedîyê Keleha Boşatê dikin lê li gor ragihandina xelkê Meyafarqînê jî dema ku Mîr Husamedînê Eyûbî ji bo parastina Hisnkeyfayê ji Meyafarqînê derdikeve Şêx Zeydo bi zora xwe dest datîne ser vî bajarî (2019: 166). Ji vegêranên din ên Hesen Hisnî em têdigihîjin ku Şêx Zeydo ji vê rewşê sûd werdigire û bi zorê dest datîne ser Meyafarqînê. Lê piştî ku Eyûbî êrîşa Artûqîyan dişikînin Şêx Zeydo ditirse ku Melîk Adilê Eyûbî êrîşî wî bike û berî ku ev yek biqewime di gel hin dîyarîyan diçe Hisnkeyfayê û bi pejirandina Melîk Adilî xwe bi Eyûbîyan ve girê dide û dibe walîyê wan ê Meyafarqînê (2019: 175). Bi vî awayî dema ku Melîk Adil dixwaze tirkmenan ji Dîyarbekirê derxe mîna hin mîrên din ên kurdan, Zirkî jî beşdarî wî dibin û tirkmenan têk dibin (2019: 242-243). Herweha dema ku Sultanê Eyûbî diçe Sêrtê û li wir civîneke mezin çê dike di nav mîrên girêdayî yên Eyûbîyan da Mîr Nasiredînê Zirkî û Şêx Îzedînê Zirkî jî hene (2019: 278). Salên paşê Şêx Behaedînê serokê Zirkîyan di demên şer û êrîşan da arîkarîya Eyûbîyan bike (2019: 293) jî di dawîya sedsala 14ê da peywendîya wan têk diçe û Zirkî li dijî Eyûbîyên

Hisnkeyfayê şer dikin. Ev jî nîşan dide ku di van salan da Zirkî li hember Eyûbîyan serî hildidin û ji bin kontrola wan derdikevin (Yaz, 2024: 64).

Dîroknasê serdema Aqqoyunî Ebubekrê Tihranî li ser dîroka sedsala 15ê ya Zirkîyan dîyar dike ku serokê Aqqoyunîyan Kara Yuluk Osman Beg dema ku sînorê xwe ber bi mîrektîyên kurdan ve fireh dike dest datîne ser hin kelehên Zirkîyan, ji hinekan bac werdigire û hinekan jî talan dike (2014: 45). Ji ber vê mîrên Zirkî di gel mîrên Mêrdîn, Cizîr û Silêmanî (Silîvî) li hember wan demekê bi Kara Yûsifê serokê Qereqoyunîyan ra tifaqê çê dikin û li hember wan şer dikin. Lê di vî şerî da têk diçin û dîsa kelehên wan dikeve destê Aqqoyunîyan (2014: 49-50, 71). Herçend Zirkî heta 1456ê li dijî Aqqoyunîyan li ber xwe bidin jî di serdema Hesenê Dirêj da têkilîya wan û Aqqoyunîyan baş dibe, Omer Begê mîrê Tercîlê keça xwe dide Hesenê Dirêj û ew jî desthilata wan a li kelehên navborî dipejirîne (Aydeniz, 2012: 59).

Berevajî mîrektîyên din ên kurdan, di vê serdemê da ji ber vê têkilîya xizmayetîyê, desthilata Zirkîyan berfireh dibe. Di vê çarçoveyê da Aqqoyunî di 1466ê da dema ku dest datînin ser Bedlîsê li ser fermana Hesenê Dirêj ji bilî Tercîl, Entax, Mîhranî û Nûşadê (Boşad) rêveberîya Bedlîsî jî dide destê xezûrê xwe Omer Begê Zirkî û ev desthilat di dema Budaq Begê kurê Omer Begî da jî didome (Bedlîsî, 2007: 342). Desthilata mîrên Zirkî piştî mirina Hesenê Dirêj di serdema Sultan Yaqûbê Aqqoyunî da jî bi heman awayî didome (Aydeniz, 2012: 135). Bi vî awayî sînorê desthilata Zirkîyan ji Tercîl û Entaxê heta bakurê Sêrt û Bedlîsê berfireh dibe. Di salên paşê da Bedlîs ji destê wan derkeve jî du şaxên wan ên giring li kelehên Dêrzin û Girdikanê berdewam dibin. Bi vî awayî di sedsala 16ê da çar şaxên sereke yên Zirkîyan dimînin ku li Entax, Tercîl, Dêrzin û Girdikanê hikum dikin û salên paşê ji van şaxan hin şaxên din jî peyda dibin.



Bi saya Şerefxanî dîroka Zirkîyan herî baş di sedsala 16ê da tê tomarkirin. Di serê vê sedsalê da dema ku Şah Îsmaîl êrîşî Dîyarbekirê dike Keleha Entaxê ji destê Ehmed Begê Zirkî derdixe û dide Qacaran. Li ser vê Zirkî ji welatê xwe derdikevin û ev rewş heta Şerê Çaldiranê didome. Lê mîna binemale û hozên din ên kurdan, Zirkî jî piştî Şerê Çaldiranê û têkçûna Sefewîyan dest bi vegerandina welatê xwe dikin. Ji bo vê demekê xwe li nêzî Entaxê li keleha wêran a Milhê (Melê) radigirin û li dû derfeteke guncaw digerin ku welatê xwe ji bin destê wan rizgar bikin (2007: 337). Bi vegêrana Şerefxanî piştî amadekarîyên pêwîst, şeveke tarî ya zivistanê Keleha Entaxê dorpêç dikin, bi dizî hildikişin ser, bi mertek û benan merdîwanan çê dikin û “mêrxasên kurdan ên zîrek û hosta” xwe digihîjînin ser kelehê û dikevin hundir. Bi vî awayî parêzvanên qizilbaşan dikujin, wan ji keleha xwe derdixin û careke din Ehmed Begî dikin serokê xwe (2007: 338). Li gor Mihemed Emîn Zekî Begî, Ehmed Begê Zirkî bi arîkarîya dîyarbekirîyan Entax û Meyafarqînê ji destê neyaran derdixin (2002: 121) û ev agahî jî bi dîtina me sedema çêkirin yan nûjenkirina beşa Şafîyan a Mizgefta Mezin a Dîyarbekirê ji alîyê Ehmed Begî ve ron dike û dibe ku ev yek ji ber vê arîkarîyê be û Ehmed Beg vê qencîya gelê Dîyarbekirê bi vî awayî padaşt kiribe.

Di serdema Osmanîyan da statukoyeke nû çê dibe. Osmanî mîna mîrektîyên din ên kurdan mafê rêveberîyên her çar şaxên Zirkîyan dipejirînin û di çarçoveya "ehidname"yên Sultan Selîm û Qanûnî da rêveberên wan ji bavî derbazî kurî dibe ku di lîteratura sîyasî ya Osmanî da jê ra "yurtluk-ocaklik" dibêjin (Şerefxan, 2007; Bizbirlik, 1996: 85; Acar, 2012: 25). Dîsa li gor van ehidnameyan eger ji wê malbatê wêrisekî nemîne hikumeta navendî dest danaîne ser rêveberîya wan û welatê wan radestî mîrên din ên kurd dike. Li hember vê ev mîr jî di demên şerî da divê bi hêzeke dîyarkirî beşdarî artêşa Osmanî bibin û ji bo asayişa welatî berpirsyarî wergirin. Bi vî awayî di serdema Osmanî da her çar şaxên Zirkîyan di çarçoveya sancaqên "yurtuluk-ocaklik"ê da dibin xwedî mafên rêveberîyê û bi dewleta Osmanî ve tên girêdan.

Şerefxan dîroka sîyasî ya şaxa Entaxê bi Ehmed Begî (?-1540) dide destpêkirin ku kurê Mîr Mihemedê Zirkî û hevçaxê Şah Îsmaîlê Sefewî ye. Ev jî nîşan dide ku Şerefxan ji bo vegêrana dîroka şaxên Zirkîyan serdema Osmanîyan dike bingeh. Ji ber vê ji serdema Ehmed Begî heta dema nivîsîna pirtûka xwe behsa hikumranîya Şahim Begê kurê Ehmed Begî (1540-1549), Yûsif Begê kurê Ehmed Begî (1549-?), Hesen Begê kurê Yûsif Begî (1574-1594) û Welî Begî (?-1598) dike (2007: 337-341).

Vekolerên hevçerx piştî Şerefxanî ji arşîv û belgenameyên Osmanî rastî van mîrên Entaxê tên: Ehmed Begê Kurê Welî Begî (1598-?), Elîxan Beg (?-1645), Seyîd Mehmûdê kurê Elîxanî (1645-?), Ebdulah Beg (?-?), Mîr Mihemedê Vala (1666), Seyîd Mistefa Beg (1692) Mîrlîwa Seyîd Ebdulah (1695), Elî Beg (1698-?), Îsmaîl Beg (1701-?), Îbrahîm Beg (1712-1713), Ewlîya Beg (1713-?), Seyîd Îbrahîm Beg (1715-1726), Ehmed Begê kurê Seyîd Îbrahîmî (1726-?), Ehmed Beg (1730-?), Xelîl Beg (1762), Ehmed Beg (1799-1800) û mîrê dawî yê Entaxê Huseyn Beg (1833) (Pekol, 2017: 19-21; Ekinci, 2022: 164; Işık, 2023: 97-102).

Şerefxan şaxa Tercîlê ya Zirkîyan ji Omer Begê kurê Hesen Begî (?-1483) dide destpêkirin û piştî wî cih dide Budaq Begê kurê Omer Begî (1483-1505), Ehmed Begê kurê Budaq Begî (1505-1507), Elî Begê kurê Budaq Begî (1507-1530), Şemsî Beg (?-?), Heyder Begê kurê Şemsî Begî (?-1578), Budaq Begê kurê Heyder Begî (1578-1593), Huseyîn Begê kurê Budaq Begî (1593-?), Îsmaîl Begê kurê Budaq Begî (?-?) û Omer Begê kurê Heyder Begî (?-?) (2007: 342-344).

Şerefxan li ser destpêka şaxa Dêrzinê dîyar dike ku cara pêşî Habîlê kurê Şêx Hesenê Zirkî di gel kurê xwe Qabîl Keleha Dêrzinê ji destê filehan derdixin û li vir bi cih dibin. Ji mîrên vê şaxê cih dide Mîr Hemzeyê Kurê Mîr Xelîlê Kurê Mîr Gazî (?-?), Mihemed Begê kurê Mîr Hemzeyî (?-1529), Elî Begê kurê Mihemed Begî, Şah Qulî Begê Kurê Mihemed Begî (1529-1552), Yaqub Begê Kurê Mihemed Begî (1552-1577), Dûman Begê kurê Yaqûb Begî (1577-1578) û Mihemed Begê Kurê Dûman Begî (1578-?) (2007: 332-334). Vekoler, piştî van mîrên navborî diyar dikin ku Hesen Beg, Îbrahîm Beg, Heyder Beg, Cîhanşah Beg (1703-1710), Xelef Beg (1710-?) dibin mîrên Dêrzinê (Pekol, 2017: 29-30).

Şerefxan Zirkîyên Girdikanê ji nifşa Qabîlê kurê Habîlê pêşengê Dêrzinê dide zanîn. Li gor wî, Qabîl bi awayekî nerewa bi xwişka xwe ra têkilî datîne û ji tirsa bavê xwe û ji şerman wê dişîne Keleha Girdikanê û bingeha mîrên Girdikanê ji van zarokên Qabîlî û xwişka wî dest pê dikin. Ji mîrên vê şaxê jî cih dide Mîr Nasir Begê Girdikanî, Mihemed Begê Kurê Nasir Begî, Nasir Begê kurê Mihemed Begî û Mîr Mihemedî (2007: 335-337). Vekoler di belgenameyên Osmanî da rastî Xelîl Beg û Mîr Mihemedî jî tên (Pekol, 2017: 32-33) û Mîr Salihê Şêrwî jî di salên 1800an da wek mîrê Girdikanê behsa Şêx Ebdulqadirî dike (2005: 139).

Konsolosê Îngiltereyê yê li Erzeromê di gera xwe ya 1838ê da li ser qonaxa dawî ya mîrên Zirkî agahîyên balkêş dide. Li gor wî mîrê dawî yê Tercîlê Receb Beg e û di nav mîrên Zirkîyan da yê herî dewlemend ew e ku di bin destê wî da 60 gund û di xizmeta wî da 300 siwarîyên hertimî hene ku bi awayekî rêkûpêk mûçe werdigirin. Dema pêwîst bike ev mîr ji gundên xwe dikare 700 siwarî û 3-4 hezar jî pîyadeyan berhev bike û wan bi çek bike. Brant dîyar dike ku, mîrê dawî yê Liceyê (şaxa Entaxê) Huseyn Beg e. Di bin destê wî da 70 gund, di bin fermandarîya wî da 300 suwarî û 4-5 hezar pîyadeyên bi şûr û tifing hene. Em ji zanyarîyên Brantî têdigihîjin ku di vê demê da Zirkîyên Hêneyê jî wek yekeyeke rêveberîyê derketine holê û li ser vê yekeyê jî radigihîne ku Temir Begê mîrê Hêneyê li 60 gundan hikum dike û di bin rêveberîya wî da 200 siwarî û 2-3 hezar pîyade hene (2018: 45-46).

Desthilata van şaxên Zirkîyan heta sedsala 19ê jî di bin banê Osmanîyan da didome lê di serdema Sultan Mehmûdê Duyem da (1808-1839) dema ku Dewleta Osmanî dikeve nav hewldanên navendîkirin û modernkirina dewletê mîna mîrên din ên kurdan, mîrên Zirkî jî li hember vê derdikevin. Ji ber vê di Cenga Osmanî û Rûsyayê ya 1828-1829ê da beşdarî nakin û herwek mîrên Rewandiz, Botan û Hekarîyê dikevin nav hewldanên berfirehkirina desthilata xwe (Ertekin, 2021: 103-104). Di vê çarçoveyê da Temir Begê Zirkî ku li Hêneyê hikum dike, di 1830yê da têkilî bi mîrên Gêlê û kesayetîyên giring ên Farqîn û Mêrdînê ra datîne û dest bi serhildanê dikin. Ji ber vê Reşîd Paşayê walîyê Dîyarbekirê di 1835ê da li hember Zirkîyan seferekê dide destpêkirin, wan têk dibe û malbata mîran mişext dike (Brant, 2018: 45). Bi vî awayî dawî li desthilata sîyasî ya Zirkîyan tê û keleh û navendên wan vediguherin gundên biçûk. Loma jî îro Entax gundekî biçûk ê qezaya Liceyê ye, ji keleha Tercîlê tenê hin kavil mane û di şûna wê da gundê Hezroyê dibe qezayeke Dîyarbekirê. Herweha kelehên Dêrzin û Girdikanê jî kavil dibin û di şûna wan da gund tên avakirin ku niha li ser qezaya Baykana Sêrtê ne.



**3. Kêşeyên Desthilatdarîya Zirkîyan wek Prototîpeke Desthilatdarîya Kurdan di Serdema Osmanî da**

Rêveberîya împaratorî û dewletdarîya pêşmodern ji sîstema navendî ya modern cîyawaztir ji xelekên cîyawaz ên desthilatê pêk tê. Herçend di navenda wê da paytext, binemale û padîşahekî hebe jî di bin wê da wek rengvedana vê sîstemê gelek desthilatên navçeyî yên biçûk hene ku di navenda wan da jî bajarek, kelehek, binemaleyek û mîrek heye. Kurd di serê sedsala 16ê da di

navbera her du împaratorîyên Osmanî û Sefewî da xwedî pêgeheke stratejîk in û piştî destdirêjî û serederîya xirab a Şah Îsmaîlê Sefewî û cîyawazîya mezhebî ya kurdan û Sefewîyan mîrên Kurdistanê bi dilxwazî dibin beşek ji Dewleta Osmanî. Hûrgilîyên vê îltîhaqê di "muahedeya hûmayûn" a Qanûnî da (1535) tê ronkirin (Ekincî, 2023: 23) ku di encama vê da pêşî Sultan Selîm û paşê jî Qanûnî Sultan Suleyman di bin navên "hikumet" û "sancaq"an da wek monarşîyeke biçûk mafê rêveberîya mîrên kurdan dinasin û ev rewş bi hin hevraz û nişûvan heta nîvê yekem ê sedsala 19ê didome. Di vê maweyê da ji ber çend sedemên dîyarker desthilata mîrên kurdan her ku diçe lawaz dibe û ji ber van hokaran di sedsala 19ê da ev mîrektî bi yekcarî ji alîyê Dewleta Osmanî ve tên hilweşandin û dawî li desthilata kurdan a herêmî tê. Li gor zanyarîyên ku bi piranî Şerefxan behs dike û geşedanên ku piştî wî çê dibin, em dikarin van kêşeyan di bin sernavên jêr da destnîşan bikin ku dibin sedema lawazîya desthilata rêveberîya şaxên Zirkîyan.

### 3.1. Rikeberîya di navbera Endamên Binemaleya Mîran da ji bo Wergirtina Desthilatê

Çawa ku mîrên kurd li ser destnîşankirina mîrêmîranekî nikarin li hev bikin û li ser pêşnîyaza Îdrîsê Bedlîsî bi mîrêmîranê Osmanî razî dibin, ev kêmasîya wan di dîyarkirina mîrên navxweyî da jî gelek caran derdikeve holê. Ji ber vê kengê endamên binemaleya mîrên Zirkî bi hev dikevin ji bo çareserkirina kêşeyên xwe berê xwe didin Stenbolê, her carê beşeke desthilata xwe ji dest didin û bi awayekî lawaztir vedigerin welatê xwe. Ji vî alîyî ve Şerefxanê Bedlîsî li ser vê rewşa mîrên Zirkî zanyarîyên giring dide ku prototîpeke mîrên din ên kurdan in. Bo nimûne piştî mirina Ehmed Begê mîrê Entaxê her sê kurên wî Şahim Beg, Yûsif Beg û Mehmûd Beg li ser mîrektîyê li hev nakin û ji bo çareserkirina vê kêşeyê diçin Stenbolê. Li ser vê, Dîwana sultanê Osmanî biryar dide ku dahata welatê wan di navbera her sê birayan da bê parvekirin û beşek jî bikeve bin mulkîyeta taybetî ya sultanê Osmanî. Bi vî awayî nahîyeyaya Rabit, Meyafarqîn, gundê Ciqsê û malên xeracê yên kafiran ji destê Zirkîyên Entaxê derdikeve û dikeve ser mulkê taybetî yê Sultanî (2007: 339).



Di nav Zirkîyên Entaxê da piştî mirina Hesen Beg û Yûsif Begî jî kêşeyeke weha derdikeve. Herçend li gor rêbaza bidestxistina heq û îrsîyetê Welî Beg li cihê wî rûne jî ji pismamên wan Cîhanşah Begê kurê Zorab Beg pê ra dikeve nav dijberîyê û dixwaze mîrektîyê jê bistîne. Ji bo vê bi Dîwana Sultanî ra dikeve têkilîyê û dîyar dike ku eger mîrektîyê bidinê dê salê 20 hezar filorîyên[4] zêdetir bide xezîneya Dîyarbekirê. Dema Welî Beg vê dibihîze ew jî heman rêjeyê pêşnîyaz dike û bi vê tawîzê Cîhanşahî berteref dike (Bedlîsî, 2007: 340). Ev jî nîşan dide ku mîrên Zirkî bi destê xwe, bi bertîldana hikumetê hem desthilata xwe lawaz dikin hem jî rê li ber hikumeta navendî vedikin ku li hember wan, desthilata xwe berfirehtir bike. Bi vî awayî her guherîna mîrekî dibe sedema

[4] Navê pareyeke zêrîn e, ji ber ku cara pêşî li Floransayê hatîye çapkirin ev nav lê hatîye kirin.

derketina kêşe û rikeberîyê di navbera endamên binemaleya mîran da û rê li ber seqamgîrîya rêveberîya Zirkîyan digire.

Li alîyê din ev rikeberî dibe sedem ku desthilata Zirkîyan dabeş bibe û ji her şaxekî şaxên nû çê bibin. Ji ber vê milmilaneyê berî Osmanîyan mîrektîya Girdikanê ji Dêrzinê vediqete (Epözdemir, 2011: 27) û di serdema Osmanîyan da jî Zirkîyên Entax û Tercîlê şaxên Mîhranî û Hêneyê peyda dibin û xweserîya xwe radigihînin. Ev jî rêveberîya wan li hember desthilata navendî lawaz dike û rê li ber destwerdana Osmanîyan xweş dike.

### 3.2. Destwerdana Osmanîyan

Mîrên Zirkî herwek mîrên din ên Kurdistanê dema ji bo wergirtina desthilatê dikevin nav rikeberîyê di rastîyê da rêya destwerdana rayedarên Osmanî jî xweş dikin. Di mînaka Welî Beg û Cîhanşah Begî da dema ku mîrên Zirkî rayedarên Osmanî hînî bertîlê dikin çend sal paşê di serdema "Îbrahîm Paşayê Zalim" da sancaqa Entaxê bi merca ku salane 40 hezar filorîyan bide xezîneya Dîyarbekirê, mîrektîya Zulfîqar Begê kurê Şahim Begî tê pesendkirin. Ev rewş heta ku Îbrahîm Paşa ji wîlayeta Dîyarbekirê tê ezilkirin jî didome. Piştî ezilkirina wî dîsa Welî Beg mîna berê bê merc ji Sultan Mehmedê Sêyem fermana mîrektîya Entaxê werdigire (Bedlîsî, 2007: 340-341) û rewş asayî dibe.

Ji bilî van kêmasîyên mîrên kurdan ku ew bi xwe ji bo destwerdana Osmanî rê xweş dikin, em dikarin bibêjin ku Osmanî bi xwe jî kengê ji êrîş û sergêjanîyên Sefewîyan biewle dibin desthilata xwe li ser rêveberîyên mîrên Kurdistanê tund dikin û dixwazin hêza navendê zêde bikin (Zekî Beg, 2002: 143). Ev jî nîşan dide ku Osmanî biçûkkirin û kontrolkirina mîrên kurdan wek stratejîyekî dibînin û destdirêjîya wan ne tenê ji ber rêxweşkirina binemaleya mîran e. Ji ber vê ji rewşa wan a nelihev sûd werdigirin, gelek caran di karûbarên mîrektîyên wan da destwerdanê dikin û bi çêkirina hin hincetan mafên wan ên rêveberîyê binpê dikin.



Di vê çarçoveyê da piştî ku hêza Sefewîyan tê şikandin û sînorê di navbera Osmanî û Sefewîyan da aram dibe di serdema mîrektîya Şahim Begî da Rustem Paşayê wezîrê Osmanî wî bi dizî û xîyanetê tawanbar dike û bi fermana Sultan Suleymanî wî dide kuştin. Piştî vê rûdanê, mîrektîya Entaxê nêzîkî 20 salan ji destê binemaleya Zirkî tê derxistin û ji alîyê fermanberên Osmanî ve tê birêvebirin. Lê di pêvajoya rûdana Elqas Mîrzayîyê Sefewî da dema ku Sultan Suleyman ber bi Azerbaycanê ve diçe sancaqa Entaxê bi mercekê dide Yûsif Begî ku keleha wê xirab bike û zeameta xwe jî bixe ser ya sancaqê. Ev rûdan, mînakeke tîpîk a daxwaza biçûkkirin û kontrolkirina mîrektîyên kurdan e ku herçend Entax careke din ji bo mîrên Zirkî bê vegerandin jî ev bi şikandina hêza wan a bergerîyê pêk tê da ku siberoj nikaribin li dijî Osmanîyan serî rakin û di vê keleha saxlem da xwe biparêzin. Ji ber berdewamîya vê sîyasetê piştî çend salan dema ku Yûsif Beg dimire dîsa Entaxê didin rêveberekî Osmanî ku navê wî Ehmed Begê Hacî Huseyn e. Lê du sal paşê dema Sultan Selîmê Duyem tê ser textî Hesen

Begê kurê Yûsif Begî diçe Stenbolê û bi arîkarîya Mehmed Paşayê serwezîrê Osmanîyan careke din mîrateya binemaleya wî lê tê vegerandin (Bedlîsî, 2007: 339-340).

Ev destwerdan û encamên wê yên nerênî piştî şikestina Osmanîyan li hember Şah Ebasî di rapora Ezîz Efendî da jî tê tomarkirin (1632-1633). Di beşa sêyem a vê raporê da behsa rewşa berê û niha ya mîrên kurdan tê kirin û yek ji sedemên vê şikestinê jî lawazxistina mîrên kurdan tê destnîşankirin. Ji bo vê tê pêşnîyazkirin ku rewşa mîrên kurdan herwekî serdema Sultan Selîm û Qanûnî bê sererastkirin da ku li hember êrîşên Sefewîyan welatê Osmanîyan biparêzin (Ekinci, 2012: 15). Em ji raporê têdigihîjin ku dema ku Dewleta Osmanî bi seferên rojavayê ra mijûl dibe gelek caran mîrêmîranên Osmanî li mîrên kurdan zulm dikin, herçend mafê wan ê ezlkirinê nebe jî bi kêfa xwe hinek mîran ezil dikin û hinekan jî dikujin. Ji ber vê berevajî ehidnameyên Sultan Selîm û Qanûnî gelek caran mulkê wan didin bîyanîyan, bac ji wan distînin û wan qels dixin (2012: 24).

Herçend Ezîz Efendî pêşnîyaza sererastkirina vê rewşê bike û padîşahê wê serdemê bi "hikumê humayûnî" bacwergirtina ji mîrên kurdan qedexe bike jî (2012: 27) ev destwerdan salên paşê jî didomin û her dema ku mîrên Zirkî guh nedin daxwazên Osmanîyan bi çêkirina hincetekê tên cezakirin. Bo nimûne di 1704ê da Dewleta Osmanî dixwaze rêveberîya Dêrzinê bide destê Xelef Begê Bedlîsî û mafê Zirkîyan binpê bike. Dema ku Cîhanşahê mîrê Dêrzinê li dijî vê biryarê derdikeve jî ji bo tedîb û tenkîl walîyên Dîyarbekir û Wanê bi ser da dişîne. Cîhanşah xwe li hember wan ranagire û xwe ber bi çîyayan vedikêşe. Herçend di 1708ê da Sultan Ehmedê Sêyem careke din mîrektîya wî lê vedigerîne jî du meh paşê dîsa dest datîne ser mîrektîya wî (Epözdemir, 2011: 29-30). Bi heman awayî di serdema Sultan Selîmê Sêyem da jî dema ku hin daxwazên Osmanîyan nayên cihbicihkirin Nuh Beg û Temir Begê Zirkî wek "şeqî" tên ragihandin. Ji bo jinavbirina wan ji begên din ên Zirkî û begên deverê tê xwestin ku arîkarîya Zuhdu Paşayê walîyê Dîyarbekirê bikin da ku wan bînin rayê. Bi vî awayî dewleta Osmanî dema nikare rasterast asayişê dabîn bike ji alîyekî ve ji hêza rêveberên cîyawaz ên malbata Zirkîyan û mîrên din ên Kurdistanê sûd werdigire ji alîyekî ve jî wan li dijî hev sor dike û zemîna şer û dijberîyan di nav wan da çê dike (Ekinci, 2022: 166-168) da ku careke din ew jî bi heman awayî tola xwe ji yên din bigirin. Bi vî awayî ev rewş wek gerînekê her carê mîrekî kurd dike armanc, wan dadixe û hikumeta navendî bilind dike.

Jixwe herî dawî jinavbirina desthilata Zirkîyan bi vê rêbazê tê pêkanîn. Lewra tevî ku Dewleta Osmanî serhildana 1819ê ya eşrafên Dîyarbekirê bi arîkarîya Eyûb Begê Milî, Telî Îbrahîm Beg, Huseyn Beg û Temir Begê mîrên Tercîl, Entax û Hêneyê yên Zirkî bitepisîne û padîşah wek dîyarî ji wan ra deh "xilat"ên samûrî bişîne jî çend sal paşê di 1827ê da vê carê bi rêya nameyekê ji Eyûb Begê Milî dixwaze ku li dijî Receb Begê mîrê Tercîlê arîkarîya hêzên hikumetê bike. Bi vî awayî serederîya "şeqî"yekî bi Receb Begî dikin û wî bi zordestî û rêbirîyê tawanbar dikin (Bayraktar, 2017: 140-142). Li ser vê Receb Begê Zirkî bi arîkarîya

serekekî kurd ê din tê jinavbirin û ev dibe çarenûsa mîrên din jî. Li hember vê rewşê, herçend mîrên Zirkî bi mîrê Gêlê, hozên derûdora Madenê, Mîrza Axayê Silivî û bi taybetî jî bi Mîr Mihemed Paşayê Rewandizî ra tifaqekê çê bikin (Ertekin, 2021: 109-111) û hêza xwe berhev bikin jî nikarin li hember sîyaseta navendîkirina Dewleta Osmanî xwe ragirin û di dawîyê da ji nav diçin û ji welatê xwe tên mişextkirin.

### 3.3. Şerên Navxweyî

Şerefxan vê kêmasîya mîrên kurdan di mînaka Zirkîyên Dêrzin û Girdikanê da berbiçav dike ku gelek caran dikevin qirika hev û bi vê rewşa xwe desthilata xwe lawaz û ya navendê jî bihêztir dikin. Li Dêrzinê piştî mirina Mîr Hemzeyê kurê Mîr Xelîlî her çar kurên wî li ser desthilatê dikevin pêsîra hev û dest bi şerî dikin. Di encama vî şerî da Elî Beg her sê birayên xwe têk dibe û dibe mîrê Dêrzinê. Piştî mirina wî di 1535ê da li ser fermana Sultan Suleymanî li cihê wî, birayê wî Şah Qulî Beg dibe mîr û heşt salan bê kêşe mîrektî dike. Lê carekê dema ku ji Stenbolê vedigere rastî Nasir Begê Zirkî yê mîrê Girdikanê dibe û ji ber neyartîyeke wan a kevin Nasir Beg û zilamên wî dikuje (2007: 333).

Ev rûdan li ser gundê Minarê çê dibe û ev gund di navbera mîrektîya Dêrzin û Girdikanê da dibe sedema şerekî dûrûdirêj. Şah Qulî Begê mîrê Dêrzinê ji bo ku ev gund di nav sînorên Dêrzinê da bimîne diçe Stenbolê û ji Sultan Suleymanî ji bo vî gundî fermanekê werdigire. Nasir Beg dema vê dibihîze hêrs dibe û ji bo tolhildanê berê xwe dide Stenbolê. Li bajarê Boluyê rastî hev tên, di navbera wan da şerekî mezin çê dibe û Şah Qulî Beg û hemû xizmetkarên wî ji alîyê Nasir Begî ve tên kuştin. Li ser vê mîrlîwayê bajêr Nasir Begî û 30 zilamên wî digire û li ser fermana Sultanî wan bi dar ve dike (Bedlîsî, 2007: 335-336). 

Ji ber vê neyartîyê Mihemed Begê Girdikanî bi handana Şemsedînê Kedxudayê Hezoyê di gel Mihemed Begê kurê Dûman Begê Dêrzinê dest bi şerî dike. Ji ber kîn û tolhildanê bajar û gundên Dêrzinê dişewitîne û talan dike. Li ser vê Mihemed Begê Dêrzinî jî bersiva wî dide û di şerekî da Mihemed Begê Girdikanî bi giranî birîndar dike. Herçend wî bigihîjînin Keleha Girdikanê jî rojek paşê dimire. Piştî vê Mihemed Begê Dêrzinî êrîşî serekên Girdikanê dike û hemû kesên piştevanên vî şerî dikuje û dest datîne ser malên wan (Bedlîsî, 2007: 334). Di encamê da bi navberkarîya mîrê Hezoyê û Zeynel Begê Şêrwî li hev hatin çê dibe û li ser vê lihevhatinê Mîr Mihemed Begê Dêrzinî di şûna xwîna bavê wî da gundê Minarê û hinek mal û erzaqan dide Nasir Begê Kurê Mihemed Begî (Bedlîsî, 2007: 336). Bi vî awayî ji ber gundekî çend mîrên Zirkî û zilamên wan tên kuştin û bi destê xwe hêz û desthilata hev kêm dikin.

### 3.4. Dijberîya Zirkîyan di gel Desthilatdar û Hozên Cîran

Ji çavkanîyên dîrokî tê famkirin ku ji bilî milmilaneya navbera şaxên Zirkîyan di navbera wan û mîrektî û hozên din da jî car bi car dijberî û pevçûn çê dibin. Em ji çavkanîyên dîrokî hîn dibin ku di sedsala 14ê da di navbera Zirkî û Silivîyan (Suleymanî) da gelek caran şer çê dibin û karîgerîya vî şerî heta sedsala

19ê jî didome. Hesen Hisnîyê dîroknûsê Eyûbîyên Hisnkeyfayê, bi hûrgilî li ser şerê Zirkî û Silivîyan radiweste ku di navbera 1370-1371ê çê dibe. Li gor wî cara pêşî di 1370yê da Zirkî êrîş dibine ser Silîvîyan, gelek kesên wan dikujin û malên wan talan dikin. Li ser vê Silîvî jî bersiva wan didin û heta ber derîyê Meyafarqînê didin dû wan û gelek kesan ji wan dikujin. Li hember vê, Zirkî li Meyafarqînê dor li wan digirin û Mîr Celaledînê serokê wan dikujin. Li ser vê Silîvî ji ber wan direvin û Zirkî ji vê rewşa wan a perîşan sûd werdigirin û dema ku Silîvî mijûlî şîna Mîr Celaledînî ne, malên wan talan dikin.

Piştî demekê Silîvî xwe berhev dikin û bi arîkarîya hin mîr û hozên din ên kurdan di êrîşeke berevajî da Şêx Şemsedînê birayê Şêx Behaedînê serokê Zirkîyan dikujin. Herweha dema ku Zirkî li Meyafarqînê mijûlî civînê ne, êrîşî keleha Kenderîbê dikin û malên Zirkîyan talan dikin. Li ser vê dîsa di navbera wan da şer çê dibe û Silîvî bi arîkarîya hevpeymanên xwe Zirkîyan dişikînin û vedigerin welatê xwe. Ev şer di 1371ê da bi destpêşxerîya Mîr Seyfedînê Botî û bi pesendkirina Eyûbîyên Hisnkeyfayê bi dawî bibe jî (2019: 314-318) tu car di navbera van binemaleyan da aştîyeke berdewam çê nabe. Ji pêşhatên dîrokî tê famkirin ku di salên paşê da desthilata Zirkîyan li Meyafarqînê kêm dibe û piştî demekê Meyafarqînê ji dest didin. Em dikarin bibêjin ku neyartîya Zirkî û Silîvîyan bi derbazbûna sedsalan pîr bibe jî ji bîr nabe. Loma jî ev milmilane heta sedsala 19ê dirêj dikêşe. Li ser vê neyartîyê James Brantê ku di 1838ê da li herêmê digere, dîyar dike her sê mîrên Zirkî yên Entax, Tercîl û Hêneyê 15 salan di gel Mîrza Axayê serokê hoza Silivîyan di nav şerî da bûne (2018: 46). Ev jî nîşan dide ku rikeberîya di navbera wan da her berdewam bûye û salên dûrûdirêj hev lawaz kirine. 

Em heman dijberîyê di navbera şaxên din ên Zirkîyan û cîranên wan da jî dibînin. Salihê kurê Xan Budaqê mîrê Şêrwanê radigihîne ku mîna bavê xwe ew jî gelek caran bi mîrên Zirkî ra dikeve nav şer û pevçûnan. Li ser vê rewşê Mîr Salih dîyar dike ku şer û hevkuştin ji kurdan ra bûye adeteke bêyom û dema derfeta şerê wan û bîyanîyan nebe ew xwe bi xwe şerê hev dikin û mîna kewan hev dikêşin ser dava dijminî. Ji ber vê halê perîşan ê kurdan vedigerîne ser vê taybetmendîya wan û vê wek sedema sereke ya paşvemana wan dibîne ji cîranên wan ên ereb, ecem û roman (2005: 133-134).

**3.5. Mîrên Zarok**

Monarşî di nav xwe da hin kêmasîyên sîstemîk vedihewîne û derbazbûna rêveberîyê ji bavî bo kurî yek ji kêmasîyên wê yên herî berbiçav e. Ev şêwaza rêveberîyê dibe sedema binpêkirina prensîba lîyaqetê ku ji bo her desthilatek xaleke gewherî ye. Mîrektîyên binemaleyî yên kurdan jî wek mînakên biçûk ên monarşîyê rûbirûyê kêşeyên bi vî awayî dibin û em di mînaka Zirkîyan da dibînin ku gelek caran mîrên zarok tên ser hikum. Ji nav mîrên Zirkî piştî Hesen Begê mîrê Entaxê bi fermana Sultan Muradî mîrektî bo Yûsif Begî tê dayîn. Yûsif Beg dema ku dibe mîr hêja zarok e û ji ber sedemeke nedîyar zû dimire. Ev rûdan dibe sedem ku ji bo mîrektîyê Welî Beg û Cîhanşah Beg li hember hev derkevin û

herwek li jor jî hat behskirin ev kêşe bi rêya bertîldana rayedarên Osmanî bê çareserkirin (Bedlîsî, 2007: 340).

Mîrên zarok di şaxên din ên Zirkîyan da jî derdikevin pêşîya me. Bo nimûne dema Dûman Begê mîrê Dêrzinê di şerekî da li hember Qizilbaşan dimire kurê wî Mihemed Beg di 15 salîya xwe da dibe mîrê Dêrzinê (Bedlîsî, 2007: 334). Bi heman awayî piştî ku Mihemed Begê Girdikanî ji alîyê mîrê Dêrzinê ve tê kuştin kurê wî Nasir Beg jî di temenê zaroktîyê da dibe mîrê Girdikanê. Ev mîrê zarok li cihê ku bi karê rêveberîya mîrektîyê ra mijûl bibe, li gor siruşta xwe ya zaroktîyê gelek caran dilîze û dema xwe bi henek û lîstikan derbaz dike. Rojekê dema ku bi xizmetkar û qeşmerê xwe yê bi navê Çenberî ra diçe nêçîrê Çenber heşîşê dikêşe, bi henekan serê xencerê dide ser sîngê Nasir Begî û wî dikuje. Li ser vê di şûna Nasir Begî da bi fermana sultanê Osmanî Mîr Mihemedê kurê wî dibe mîrê Girdikanê ku ew bi xwe jî zarok e (Bedlîsî, 2007: 337). Bi vî awayî li dû hev çend mîrên zarok dibin mîrên Girdikanê û ev jî dibe sedema lawazketina vê mîrektîyê.

**4. Beşdarîya Zirkîyan di Geşedana Çanda Kurdî da**

Ji çavkanîyên dîrokî derdikeve ku Zirkî nêzî hezar salî wek binemaleyeke desthilatdar, di geşedana çanda madî û manewî ya kurdan da cihekî giring digirin. Ji xebatên ku li ser Zirkîyan hatîye kirin, derdikeve ku ev binemale bi kelehên xwe yên mîna Entax, Mîhranî, Nûşad (Boşad), Tercîl, Dêrzin, Girdikanê û bi mizgeft, medrese, tekya, qesir, hemam û kanîyên xwe gelek berhemên madî didin çêkirin ku hin bermahîyên wan gihîştine heta îro jî. Ji çavkanîyên dîrokî û berhemên mayî dîyar dibe ku Ehmed Begê mîrê Entaxê di 1528ê da li navenda Dîyarbekirê ji bo şafîyan mizgeftekê dide nûjenkirin (Işık, 2021: 79; Budak, 2023: 20) ku îro bûye beşek ji Mizgefta Mezin a Dîyarbekirê. Herweha ev mîr giringîyeke mezin dide avadanîyê ji ber vê jî li navenda Liceyê di nav keleheke kevin a hilweşîyayî da mizgeftek, medreseyek û zawîyeyekê bi hev ve dide çêkirin û ji bo dabînkirina xercîyeyên van dezgehan bi navê “Weqfa Mescid û Medrese û Zawîyeyê ya Ehmed Begî” weqifekê ava dike û dahata rezê Eynê Dilê yê Liceyê û gundê Mehmedbana Hênêyê ji bo wê vediqetîne (Bizbirlik, 1996: 130; Işık, 2023: 213). Bi demê ra di nav vê kulîyeyê da pirtûkxaneyek jî tê çêkirin (Işık, 2021: 80) û ev kulîye heta erdheja Liceyê jî dibe navenda pêgihandina gelek kesên giring. Ji vê kulîyeyê îro tenê beşa mizgeftê hatîye restorekirin û yên din hemû têk çûne. Herçend îro şopên gelekan nemabin jî endamên binemaleya Zirkî û xelkê herêmê behsa hin avadanîyên din ên Zirkîyan jî dikin. Di navenda Liceyê da Seraya Mehmet Beg û Mahmûd Begî, Kanîya Xanim Xatûnê û Kanîya Hesen Begî, Hemama Hecî Melek Beg ji van berheman in ku di erdheja Liceyê da dirûxin (Işık, 2021: 83-85). Herweha ji şaxa Zirkîyên Tercîlê Mizgefta Mezin a Hezroyê (sedsala 17ê) ji şaxên Zirkîyên Dêrzin û Girdikanê jî mizgeftên gundên Xelîl Beg (1669-1670) û Dêrzinê (sedsala 18ê) hêjayî amajekirinê ne (Pekol, 2017: 38-40). Lê ji van berhemên madî wêdatir Zirkî di berhemanîna çanda kurdî ya manewî da jî beşdarî dikin û şopa xwe li dîroka çanda kurdî dixin. Li gor zanyarîyên berdest em dê cih

bidin sê kesayetîyên Zirkî ku her duyên pêşî di dîroka çanda kurdî da xwedî cihên gelek giring in.

**4.1. Îbnu'l Ezreq**

Îbnu'l Ezreq di 1117ê da li Meyafarqînê ji dayik dibe û navê wî "Ehmed îbn Yûsif îbn Elî îbn Ezreq" e (Avad, 1975: 15, 49). Em ji berhema wî ya navdar *Tarîxa Meyafarqînê* hîn dibin ku ew jî mîna bav û bapîrê xwe yek ji burokratên serdema Merwanîyan e. Mixabin li ser binemale û hoza wî ne ew ne jî dîroknûsên piştî wî agahîyên zêdetir nadin. Lê hevbeşîya paşnav û welatî dibe sedem ku wek hîpotezekê mirov wî nîsbetî binemale û hoza Zirkîyan bike. Lewra li vê herêmê gelek kelehên Zirkîyan yên mîna Entax, Tercîl, Mîhranî û Boşadê hene û dem bi dem Meyafarqîn bi xwe jî dikeve bin hikumê wan. Ji ber vê berî me jî ji ber heman hokaran hin hin dîroknûs û dîroknasên kurd behsa Zirkîbûna wî dikin (Varlî, 1997: 337; Gümüş, 2012: 455) û ji nav van Îbrahîm Bozkurt îdîa dike ku mîrê pêşî yê Tercîlê Şêx Seyîd Hesen ji nevîyên Îbnu'l Ezreq e (2021: 234).

Îbnu'l Ezreq heta 1138ê li Meyafarqînê perwerde dibe lê di maweya jîyana xwe da ji ber mebestên perwerde û karê rêveberî û dîroknûsîyê li çendîn welat û bajarên mîna Amed, Mûsil, Mêrdîn, Dinêser, Bexdad, Şam, Xelat, Rey, Bercis, Bergerî, Nevşehîr, Tebrîz, Hema, Humus, Heleb, Menbic, Heran, Resuleyn, Dîrsaliba, Medayîn, Anî û Gurcistanê digere. Li Bexdadê zanistên fiqih, feraîz, rêziman, hedîs û tefsîrê dixwîne. Di van geştên xwe da dibe mêvanê xelîfe û hikumdaran, li Bexdadê beşdarî zewca Muqtedî dibe û li Gurcistanê jî di gel mîrê Ebzaxê beşdarî seferên Derbend û Alanê dibe (Fariqî, 2023: 24-28, 480, 493-499; Avad, 1975: 53-60).



Ji bilî vê geşt û perwerdeyê di jîyana xwe da erkên giring ên burokratîk bi cih tîne. Ji ber vê li ser şopa bapîrê xwe Ebu'l Hesen Elî bîn Ezreqî di 1148ê da dibe berpirsyarê weqfên derveyê bajarê Meyafarqînê. Di 1149ê da wek balyozê Seîd Husameddîn Temirtaş ji bo kirîna hesinî diçe Mûsilê. Li Hisnkeyfayê nazirtî, li keleha Erzenê walîtî û demekê jî qazîtî dike. Piştî vê maweyekê li Meyafarqînê serperiştîya Dîwanê û çavdêrîya Weqfa Meyafarqînê dike û herî dawî li Şamê jî çavdêrîya weqfên derûdora Şam û Dimişqê dike. Dîroka mirina wî bi başî neyê zanîn jî di hin çavkanîyan da wek 1176, di hinekên din da jî wek 1181 tê destnîşankirin (Fariqî, 2023: 24, 510-523; Beysanoğlu, 2003: XV-XVI).

Bêguman Îbnu'l Ezreq bi nivîsîna pirtûka xwe ya li ser dîroka Merwanîyan di dîroka kurdan da cihekî giring digire û bi saya berhema wî em bi awayekî hûrgilî li ser dîroka Dewleta Merwanî û bajarvanîya Meyafarqînê dibin xwedî agahîyên berfireh. Balkêş e ku vê berhema xwe ne ji ber xatirê mîr û xelîfeyekî ji ber xîret û hemîyeta xwe dinivîse û bi awayekî hişmendane dîroka bajarê xwe, tomar dike (Fariqî, 2023: 33). Ji vî alîyî ve bi bawerîya me dendika hişmendîyeke kurdewarî diçîne ku salên paşê berhemên navdar ên mîna *Şerefname* û *Mem û Zîn*ê her ji ber vê motîvasyonê tên nivîsîn û ji bo çanda kurdî dibin çavkanîyên bêhevta. Ev taybetmendî bi dîtina me giringîya vê berhemê û nivîskarê wê

zêdetir dike û bi vê taybetmendîya xwe Îbnu'l Ezreq dibe nerîtdanerê têgihîştineke xwemalî.

### 4.2. Mîr Yaqûbê Zirkî

Herwek dîroknûsîyê, di qada edebîyata nivîskî da jî ji binemaleya Zirkî kesayetîyên pêşeng derdikevin. Çavkanîyên dîrokî nîşan didin ku bavê damezirîner ê vê malbatê Şêx Hesenê Zirkî helbestên sofîgerîyê dinivîse û xwedan dîwanekê ye ku ji helbestên tirkî û farisî pêk tên (Bozkurt, 2021: 231). Ji ber ku ev dîwan negihîştîye roja îro em nizanin tê da helbestên kurdî hene yan na lê li gor Şerefxanê Bedlîsî ji mîrên vê binemaleyê Mîr Yaqûbê Zirkî xwedî dîwaneke kurdî ye. Li gor vê ragihandinê Mîr Yaqûb wek mîrekî giring ê şaxa Dêrzinê ya Zirkîyan dibe helbestvanê pêşî yê kurdîya kurmancî ku mixabin berhema wî heta niha jî nehatîye dîtin.

Li ser jîyan û berhema wî dîsa çavkanîya sereke *Şerefname* ye. Li gor vê berhemê di 1543yê da dema ku Şah Qulî Begê mîrê Dêrzinê li Boluyê ji alîyê Nasir Begê mîrê Girdikanê ve tê kuştin Mîr Yaqûbê kurê Mihemed Begî bi fermana Sultan Silêmanî dibe mîrê Dêrzinê û 25 salan li ser hikum dimîne. Şerefxan wî wek kesekî têgihîştî, xweşexlaq, dîndar û edebdost dide zanîn ku heweseke wî ya zêde ji bo helbestê heye û di vî warî da gelek çalak e. Li gor ragihandina wî, Mîr Yaqûb li ser yekîtîya Xwedê û heqîqetan li pey xwe gelek helbestan dihêle û piranîya helbestên wî jî bi kurdî ne (2007: 333).



Eger rojek ji rojan ev dîwan bê dîtin dê bibe dîwana pêşî ya kurdîya kurmancî û mîrekî Zirkî jî bibe dameziriînerê edebîyata nivîskî ya kurdîya kurmancî di serdema îslamî da. Ev berhema winda ji bilî ku di kurmancî da dîwana yekem e, Mîr Yaqûbê Zirkî jî li gor zanyarîyên me yên îro bi vê dîwanê dibe yekem mîrekî kurd ê helbestvan ku mînakên weha di nav kurdan da kêm in. Bi vî awayî Zirkî ji du alîyan ve di dîroka edebîyata kurdî da pileya yekembûnê bi dest dixin ku ew jî nivîsîna dîwana yekem a bi kurmancî ye û destpêka nerîta helbestvanên mîr e. Li ser vê rêçê di sedsalên paşê da gelek mîrên helbestvan derdikevin ku hin kesên mîna Mîr Îmadînê Hekarî (Sebûrî), Mîr Ebdula Xan (Arif), Petew Begê Hekarî, Mîr Muhemmed Teyar Paşayê Amêdî û kurê wî Îsmaîl Paşayê Amêdî mînakên vê ne (Aykaç, 2021: 351).

### 4.3. Mewlana Mihemed Zirkî

Ji bilî qadên dîrok û edebîyatê di qada zanistên dînî da jî şopên giring ên Zirkîyan tê dîtin, lewra di hemû navendên Zirkîyan da mirov rastî çendîn medreseyan tê û di van medreseyan da çendîn zanayên dînî derdikevin. Mixabin di çavkanîyên navborî da li ser jîyanname û xebatên van kesayetîyan tu zanyarîyek nîne. Lê Şerefxan dema navê her pênc medreseyên Bedlîsê û muderisên wan tomar dike, dîyar dike ku li Medreseya Hacîbegîyeyê Mewlana Mihemed Zirkî dersan dide. Li ser kesayetîya wî jî dîyar dike ku di mijara fiqhê da xwedî zanyarîyên zêde ye, mirovekî çavtêr, xweparêz, dîndar, sofî, rast û dirust e ku mînakên wî di wê demê da kêm tên dîtin (2007: 449-450).

Herwek li jor jî amaje pê hat kirin di dema Hesenê Dirêj û Sultan Yaqûbê Aqqoyunî da ji ber ku Bedlîs ji alîyê Zirkîyên Tercîlê ve tê birêvebirin ev mîrektî û bajêr dora bîst salan di bin rêveberîya Zirkîyan da dimînin em dikarin bibêjin ku hebûna zanayekî mîna Mewlana Mihemed Zirkî li Bedlîsê encameke siruştî ya vê hikumranîyê ye. Mixabin ji vî zanayî tu berhem negihîştîye roja me. Lê tomarkirina navê wî ji alîyê Şerefxanî ve nîşan dide ku Mewlana Mihemed Zirkî zanayekî giring ê serdema xwe bûye.

**Encam**

Çand, dîrok û edebîyat rengvedana bikerên xwe ne û kêm zêde rengûrûyên neteweya xwe nîşan didin. Mîna gelek warên çandî, dîroka kurdan heta roja îro jî bi başî nehatîye ronkirin û gelek xalên şêlû û tarî hene. Ji bo gihîştina zanyarîyên nû û derxistina dîmena giştî ya dîroka kurdan pêwîstî bi xebatên monografîk û navçeyî hene da ku bi rêya van parçeyên biçûk, xalên tarî bên ronîkirin.

Zirkî di dîroka kurdan a sîyasî û çandî da binemaleyeke giring û xwedî dîrokeke hikumranîya hezar salî ne. Ji ber vê endamên vê binemaleyê di maweya hikumranîya xwe da çendîn berhemên madî û manewî diafirînin. Herçend piranîya dîroknasan di çarçoveya zanyarîyên Şerefxanî da dîroka sîyasî ya vê binemaleyê bi Şêx Hesenê Ezreqî û serdema Artûqîyên Mêrdînê bidin destpêkirin jî em vê yekê wek mîteke sîyasî dibînin û dîroka wan kevintir dizanin. Lewra çavkanîyên din ron dikin ku Şêx Hesen û Zirkî berî Artûqîyan li vê herêmê hene û peywendîya Şêx Hesen û Emîr Artûqî jî bêbingeh e. 

Mîna hemû desthilatên dema xwe, sînorên hikumranîya Zirkîyan jî guherbar in. Ji zanyarîyên hin çavkanîyan derdikeve ku ev binemale dem bi dem sînorê desthilata xwe berfireh dike carinan jî paşve dikişe. Bo nimûne di dema Aqqoyunîyan da sînorê desthilata wan ji bakurê Dîyarbekirê heta Bedlîsê berfireh dibe û di dema Osmanîyan da jî Entax, Tercîl, Mîhranî, Dêrzin, Girdikan, Mîhranî û Hêne navendên wan ên rêveberîyê ne.

Şaxên hikumranîya Zirkîyan mîna mîrektîyên din ên kurdan gelek caran li ser mîrektîyê yan bidestxistina gundek yan deverekê li dijî hev şer dikin, hev dikujin, gilîya hev bi sultan û paşayên Osmanî dikin û ev jî dibe sedema lawazketina wan. Ji alîyê din ve nakokîya Zirkîyan di gel hozên cîran û hebûna mîrên zarok jî di dîroka wan da dibe sedema lawazîyê ku ev kêm zêde di hemû sîstemên monarşîk da tên dîtin. Lê ji hemûyan giringtir destwerdana Osmanîyan û destdirêjîya burokratên Osmanî dibe sedema sereke ya lawazîya Zirkîyan.

Ji alîyê çanda madî ve ji Zirkîyan gelek keleh, mizgeft, seray û avahîyên din mabin jî piranîya wan îro kavil bûne lê ji alîyê çanda manewî ve; Îbnu'l Ezreq ji alîyê dîroknûsîya kurdî ve û Mîr Yaqûbê Zirkî jî ji alîyê edebî ve du kesayetîyên giring ên Zirkî ne ku yek ji pêşengên dîroknûsîya kurdî tê qebûlkirin yê din jî helbestvanê pêşî yê kurdîya kurmancî û mîrê pêşî yê helbestvan tê qebûlkirin. Herweha di serdema hikumranîya Zirkîyan da gelek medrese tên vekirin û li van

medreseyan gelek zana peyda dibin ku Mewlana Mihemed Zirkî yek ji van e ku li Bedlîsê muderistî kirîye.

Herçend xebata Îbnu'l Ezreq bi erebî be jî ji bo dîroka Merwanîyan çavkanîyeke giring e û beşeke dîroka kurdan zelal dike. Mixabin dîwana Mîr Yaqûbî heta roja îro jî nehatîye dîtin ku piranîya wê ji helbestên kurdî pêk tê. Ev jî nîşan dide ku Zirkî hem di dîroka sîyasî ya kurdan da hem jî di xebatên çandî yên kurdî da xwedî karîgerîyeke berbiçav in û ji ber vê jî dibin beşeke giring a çand û dîroka kurdan.

**Çavkanî**

Acar, A. (2012). Dünden Bugüne Hetâkh (Atak) Kalesi. Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları. 13-45.

Avad, B. A. (1975). Meyyafarqîn ve Amed Tarihi'ni Nerede ve Nasıl Buldum?. Mervani Kürtleri Tarihi. (Çev. M. E. Bozarslan). Koral Yayınları. 9-66.

Aydeniz, V. (2012). Akkoyunlu-Kürt İlişkileri. İstanbul: Nûbihar.

Aykaç, Y. (2021). Mîr Yaqûbê Zirkî: Mîrekî Şair Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De. Ashâb-ı Kehf Şehri Lice Tarih, Edebiyat, Kültür. H. Yıldız-A. Ertekin-D. Adlığ-A. Cengiz (Ed.). Ankara: Sonçağ Akademi. 343-354.

Azimli, M. (2008). Artukluların Kuruluşu ve İlk Artuklu Emiri Necmettin İlgazi'nin Siyasi Faaliyetleri (1106-1122). Artuklular. İ. Özcoşar (Ed.). Mardin: Mardin Valiliği Kültür Yayınları. 13-20.

Bayraktar, U. B. (2017). Erken 19. Yüzyılda Kürt-Osmanlı İlişkileri: Zirki Beyleri ve Hazro'da Yerel Siyaset. Osmanlı Devleti ve Kürtler. İ. Özcoşar-S. Vali (Ed.). İstanbul: Kitap Yayınevi. 135-154.

Bedlîsî, Ş. (2007). Şerefname. (Wer. Z. Avci). İstanbul: Avesta.

Beysanoğlu, Ş. (2003). Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi Başlangıçtan Akkoyunlulara Kadar. Ankara: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları.

Bizbirlik, A. (1996). 16. yy.'da Tercil Sancağı Üzerine Notlar. Osmanlı Araştırmaları XVI. H. İnalcık-N. Göyünç-H.L. Lowry-İ. Erünsal-K. Kreıser-A.A. Şentürk (Ed.). İstanbul: Enderun Kitabevi. 85-120.

Bizbirlik, A. (1996). 16. Yüzyılın Ortalarında Atak Sancağı ve Sancak Beyleri Üzerine Notlar. Osmanlı Araştırmaları XVI. H. İnalcık-N. Göyünç-H.L. Lowry-İ. Erünsal-K. Kreıser-A.A. Şentürk (Ed.). İstanbul: Enderun Kitabevi. 109-133.

Bozkurt, İ. (2021). Aşiretler Tarihi. İstanbul: Nûbihar.

Brant, J. (2018). 1838 Yazında Kürdistan. (Çapa Duyem). İstanbul: Weşanxaneya Rûpelê.

Budak, M. (2023). Zırkan Aşiretinden Hazro Beyleri. İstanbul: Nûbihar.

Ekinci, R. (2012). Azîz Efendi'nin Islahatnâmesi Üzerine. Kürt Tarihi. 2, 12-19.

Ekinci, M. R. (2022). Beylikten Sancağa Osmanlı İdari Teşkilatında Atak (16-19. YY.). Osmanlı Devleti'nde Yurtluk-Ocaklık ve Hükümet Sancaklar. E. Çiftçi, V. Gürhan, M. R. Ekinci (Haz.). İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları. 143-186.

Ekinci, R. (2023). Peymana Hikimdaran 1535 Peymana Qanûnî Siltan Silêman Digel Hakimên Kurd. Dewlet û Mîrgehên Kurdî di Serdemên Naverast û Nû da. Zaxo: Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî. 2, 17-32.

Epözdemir, Ş. (2011). Zırkan Beylikleri Tarihinde Derzın. Ankara: Fanos Yayınları.

Ertekin, A. (2021). Atak Beylerinden Zirki Timur Bey ve Dönemin Panoramik Özeti. Ashâb-ı Kehf Şehri Lice Tarih, Edebiyat, Kültür. H. Yıldız-A. Ertekin-D. Adlığ-A. Cengiz (Ed.). Ankara: Sonçağ Akademi. 72-118.

Fariqî, Îbnu'l Ezreq (2023). Tarîxa Meyafarqînê. (Wer. E. Narozî). Kerîm El-Xulî – Yusuf Baluken (Amd.) İstanbul: Nûbihar.

Gümüş, E. (2012). Lice ve Çevresinde Kurulmuş Beylikler ve Burada Meskun Aşiretler. Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları. 451-461.

Gümüş, E. (2021). Mihrani Ekrad Sancağı: Kadim Bir Aşiret Yurtluk Ocaklığı. Artuklu İnsan ve Toplum Bilim Dergisi. 6 (1), 1-27.

Gümüş, E. (2024). Zirki Aşireti'nin Yurtluk Ocaklık Bir Sancağı: Tercil Beyliği (1515-1750). Anatikçağ'dan Günümüze Medeniyetler Kavşağında Hazro Tarih-Toplum-Kültür. O. Bozan-A. Ertekin-A. Yaz (Ed.). İstanbul: Çizgi Kitabevi. 139-162.

Hisnî, H. Î. M. (2019). Tarîxu Hisni Keyfa. Y. Baluken (Ed.). İstanbul: Nûbihar.

Işık, S. (2021). Lice Beylerî, Vakıf Ahmet Bey Camii ve Sakal-ı Şerif. Ashâb-ı Kehf Şehri Lice Tarih, Edebiyat, Kültür. H. Yıldız-A. Ertekin-D. Adlığ-A. Cengiz (Ed.). Ankara: Sonçağ Akademi. 71-92.

Işık, F. (2023). Lice Zirkileri Aile Tarihi. İstanbul: Logo Yayınevi.

Korkusuz, M. Ş. (2004). Tezkire-i Meşayih-i Amid Dayarbekir Velileri I-II. İstanbul: Kent Yayınları.

Kürd Emirlerinin Muktedir Oldukları Zamanda Yaptıkları Hizmetler. (2012). (Çev. Ö. Beyter-R. Ekinci). Kürt Tarihi. 2, 20-27.

Pekol, F. (2017). Zirki Beylikleri ve Beyleri Tarihi. Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı. Teza Çapnebûyî ya Mastirê.

Tihranî, E. (2014). Kitab-ı Diyarbekriyye. (Çev. M. Öztürk). Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.

Xan Budaq, S. (2005). Dîroka Nijada Şêrwan. (Wer. K. Soylu). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Varlî, E. M. M. H. X. (1997). Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500 Derpêç 1. İstanbul: Hoşka Weşan û Lêkolîna Sîpan.

Veroj, S. (2023). Kurdistan siyasi, içtimai, edebi, ilmi haftalık müstakil fikir mecmuasıdır. Stenbol: Weşanên Dara.

Zekî Beg, M. E. (2002). Dîroka Kurd û Kurdistanê. (Wer. Z. Avci). İstanbul: Avesta.